RAWESTANEK LI SER ZARAVÊ (HEVÇERX)



Yasirê Hesenî

Zaravê (hevçerx) yan (hevçerxî) ji wan zaravan e yên gelek gengeşe li ser hatiye kirin û bo delaletên ji êkcuda hatiye bi kar hînan, ta ku delaletên wê di gel yên hindek zaravên mîna nûxwazî û nûkirin.. hatîne têkelkirin, bi rengekê wesa ku bi "zaravekê aloz " yan bi "peyvek hevîrkî "2 bihête navkirin. Ev tevliheviya di delaletan de peydabûy gehiştiye wê radeyê ku cudakarî di navbera wan de bigehe nêzîkî pileya hevdijiyê. Ev ne tinê di nav pirtûkxaneya vekolînên kurdî yan erebî de berçav dikeve, belkû heta ev arîşe li cem yên rojavayê jî heye. Bo zanîn li pitiriya wan jêderên bo babetê nûxwaziyê hatîne terxankirin, zaravên weku: (Modernitî), (Modernization) û (Modernistic) berçav dikevin, di gel çend zaravekên weku: (Contemporarî-hevçerxî) û (Innovation-nûkirin) da têkel dibin. Ew zarav jî, li gel çend zaravekên tazetirên weku: (Proto Modernisim-nûxwaziya seretayî) û (Post Modernisim-paş nûxwazî) de, têgehên wan bi nav êk de diçin.4 Û li vê derê bo me diyar dibe arîşeya vî zaravî û yên hindekên dî jî, ne hema di çarçûvekê xwemalî de ye, belkû mesele berfirehtir e û di çarçûvekê cîhanî de ye.

Di nav nivîsînên vekoler û rexnegiran de ev zarav e bi van têgehên li xwarê hatiye bi kar hînan:

Êk: Wek zaravekê ramana (dem) î ji xwe bide, anku zêdetir bi wataya wê ya ferhengî. Evca her tiştekê li ser demekê destnîşankirî hebe yan jiyabe vî navî disitîne, heker xwe ne bi awayê wî serdemî bihizire yan darêje jî! Lewa gelek bi rengekê asayî dê bêjine hozavanekê) bo nimûne, Dr. Mesûd Kitanî, hozanvanekê hevçerx!! Çunkî di vî çerxî de dijît. Lê ji bîr dikin ku hozanên wî bi roxsar û naverok ve zarvekirina yên çerxên berî du sed-sê sed salan e, anku hozanên wî berî bibin dimirîne!

bi kêmî bi çavê evro.

Ji vekolerên ev zarav e bi rengekê giştî û bê cudakirin bi kar hînay (fazil Umer) e, ew dibîne "hemû nivîserên îro hevçerx in, çunkî her yek ji wan bo texek bijîn û hevçerx dinivîse, hosa peyva hevçerx ji hemû nivîseran digire, çunke kes ji wan bo valatiyê nanivîse "5. Lê piştî hîngê raya xwe rastve dike û axavtina xwe sinordar dike demê dibêje "hevçerxî … mirov bi çavê îro binêre ji her babetê hebe, zanistên îro verêje "6. Û her dîsa ji vekolerên ereb yê ev şop e girtî Dr. Zekî Necîb Mehmûd) e, ku dibîne hemû hozanvanên di nav me de dijîn hevçerx in, ji ber egerekê sade ku ew jî kurên vî çerxî ne. Lê ew jî-mîna Fazilê Emerî -piştî hîngê raya xwe rast dikeve.7

Du: Wek zaravekê ramana (hunerî) ji xwe bide, anku bo wî kesî yan keresteyî dihête gotin ewê xudan dîtineka taybet û rêçikeka destnîşankirî girtibe. Yan wekî hindek rexnegir dibêjin ku "rêzbendeka hunerî ye kuntirolê di berhemê edebê û hizirî de dike û sebxeka taybet dide-itê, di pêrabûnên dahênankî de ev biha ye mukum û binecih dibe ta wê radeyê ku her tiştekê ji bilî wan, li ser wî çerxî û giyanê xerîb û biyanî bête hijmartin ".8 Yan her bi ramana borî, nivîserê hevçerx ew e yê behsê arîşeyên hevçerx bi zimanekê hevçerx bike, li serdemê me bijît û kurê vî demî be. Çi 9 wek hizir yan reftar.

Yan weku vekolerekê dî gotî "pişikdariyê di rûdan û milmilanê yên serdemî de bike.10".

Li vê derê heger em seh bikin hevçerxiyê, xwe bi ramana wê ya hunerî jî, em dê bînin bi rengekî yan yê dî her girêday (dem)î ye, çunkî ramana hunerî ya neliv nîne, belkî bi borîna demî hindekê ji (hunerî) ya xwe berdide yan kevin dike û hindek (hunerî) ya nû werdigire ku berebere li gel demê nû dihêt. Dibe ji ber hindê jî beşek ji rexnegiran dibêje "heçerxiyê bihayekê demiyê aşkira heye, qûnaxeka demî ya destnîşankirî sinordar dike dûr ji rengê nivîsînê bi xwe, nû be yan kevin be, mijdar be yan ron be.11 ".

Belê, ji bo ku xwe ji aloziya delaletên vî zaravî qurtal bikin, Dr. Neyim Elîyafî serederiyeka dî di gel dike, ku ew jî bi rengekê ne êkser pêşniyaz dike: Pêş wext mebesta xwe ji bi kar hînana vî zaravî diyar bikin, aye me merem jê ramana wî ya (demî) ye yan (hunerî)?12

Lê ez pitir yê li gel boçûna Dr. Xelîl Mûsay me, çunkî bi asoyekê berfirehtir berê xwe dide meseleyê û dibêje: Hosa em serederyê digel zaravê hevçerxî yê dikin, ku gereke li ser du tiştan vekirî: Ji layekî li ser ezmongeriyê, anku berdewam tiştê nû û teknîkên nû bi xwe ve digire, ku nûkirin û nûxazyê hembêz dike, û ji layekê dî ve yê vekirî ye li ser çerxî jî, ku demî jî li pêş werdigire.13 çav

Sereray vê hemûya li ser hevçerxiyê me gotî, divêt ji bîr nekin bi karhînana wê her dê di xeleka (berwextî) yê da zivire,13 û dem kefîl e wan ramanên me dayînê pûç bike. Çunkî em dişên zaravê hevçerxiyê bo xwe bi kar bînin, yên sube bihên dê ji me wergirin û me kine parçeyek ji raburdûy û (bo) yan bimevenin!! Tinê zaravê (nûxwazî) nebe, ku (berwextî) yê dişeqîne bo (dem-zemen) î 14. Çunkî "mesele teknîk e û varêbûneka taybet e di dîtinê de "15. Anku (nûkirin) û (hevçerxî) vajiya wê dê bibe (kevin), lê (nûxwazî) vajiya wê yan bi borîna demî jî nabe (kevinxwazî).)!!

Li dawiyê em digehin encamekî: Her berhemek tinê bo çerxê xwe dê bibe hevçerx, lê bi mercekî derbirînê ji giyanê wî çerxî bike û bi kêmî teknîkên wî çerxî verêj.

Çavkanî:

1- heta di zimanê ingilîzî de peyva(contemporary) bi ramana (berwexit) jî di hête bi kar hînan. Berê xwe bide (Xelîl Îbrahîm hemmaş û xuzeyîr şihaze elî, qamos eltalib: ingilîzî-erebî, çapa sê, iraq)

2- dr. ebdulla elxizamî, teşrîh elnes:muqribat teşrîhiye li nisus şiiriye muaasire,çapa 1, dar eltelîe liltibae we el neşir, beyrot, 1987, laper 11.

3- mihemed bekir, laper 13.